Dumahîk:EdîbêMaratê

desmalê paqij dikir . Met rabû ser xwe , balgiyek danî ber pişta min û çaydana çayê danî ser êgir . Mêrê wê , apê Ehmed pêşberî min rûniştibû , por û simbêlên wî gewrbûbûn . Ji titûnê Mûşê çixarak dipêça û nefesên kûr jê dikşandin . Di gundê me de , ji aliyê cotarî û kelenkûsiyê ve, di ser xortaniya apê Ehmed re tu kes tunebû , lê wê êvarê ew bê hêz û pir xemgîn dixuya . Meta Nirgiz, çayê dida ber me û dîsan gilî gazinên xwe dikir. – Ho Xwedêyo ! Wê çawa be halê me ?. Min çi dikir , serwext nedibû . Metê min digot : Weha xeman neke ! Ka Xalis çi şaşî kiriye!?. Yan dû namûsa hinekan geriyaye !?. Na , wisan nîne . Kurê te xwestiye ku , Kurd hişyarbin û ew doza mafên xwe dikin , ew jî tiştekî xerap nîne , piçekê sebirê bi xwe de , metê ! . Helbet , ji vî derdî re jî aveke zelal wê hebe .

Bi van gotinên min re ,apê Ehmed nerme- nerm serê xwe dihejand û dîsan cixarê dipêçe û bi du nefeseên kûr bi nîvî dikir . Kat dereng dibû ,ez radibûm ser xwe . – Ezbenî êdî dereng e . Şeva we bimîne xweş! . Li mal .min serê xwe danîbû ser balgiyê , lê xew nedihate çavên min , rojên borî dihatin bîra min , Xalis hevalê min bû . Em pêkve diçûn dibistanê , ew hevalekî qenc bû û di dibistanê de pir jîr bû , mamostê me pir ji wî hezdikir . Piştî kutabûna dibistanê , bavê min ez kirim berxevan , lê daxaziya Xalis xwendin bû , carina wî , ji min re digot: Ezê biçim bajêr û li xwendegeha mamostetiyê bixwînim û bibim mamosteyê dibistana gundê me . Lê çendekî berê , Xalis û gelek hevalên me hatin girtin . Min ji dê û bavê re ev nûçe negot . Lê weke tê gotin pir lêdanê .. ka dawî çawa dibe?.

Rojekê em li binê gund , ber wê germê û zehmetiyê bê hêz man . Pişt re, di bin dareke tûyê de me dew vedixwar û bêna xwe vedikir .. Palevanekî digot : Eger xwedê hêl bide me ,karê vê zeviyê şeş rojan wê biqede . Palevanekî din digot : Wele kar xelas nabe , mala te û vê germê .. qet xebat dibe ?. Ji nişka ve Azad rabû û got: Hevalino werin mêzekin ! . Sîwarek ji gund derket û weke teyrekî ber ve me tê , çi hebê ! Ew siwarê hawarê ye !! Em rabûn û ber ve sîwêr çûn , wexta em nêzîk wî bûn , me pirskir : - Gelo , çi bûye ? . - Yosêf xêr e ?. – Wele , ne xêr e ! XAlis ,ji ber lêdanê hatiye kuştin . Du cendirman laşê wî anîn nav gund . Ax ..Ax.. serê min gêj bû , bihna min teng bû û çavên min reş bûn . Ew cî ecêb bû? Nizanim çawa ew hatibûn nav gund ! Şîneke giran bû ,gundî dora cenazê Xalis kombûbûm . Xemgîn, girî qêrîna wan digihîşte ezmanan .

Xunava bêmiraz , di nav kincên reş de dixuya .Dengê giriyê meta Nêrgiz , dilên mirovan dişewitand .Apê Ehmed li pê sekinîbû û cixara xwe vêdixist , bi nefesên kûr ew bi nîvî dikir . Laşê Xêlis , pêş çavên min bû . Ew di nava xwînê de nedihat naskirin ...

De here rêwiyo here , Edîbê mino here , mamoteyo here , bêguman weke xwendevanên me berê baş zanin , te bavê Pêşrew û Zeredeşt , di dil û hişên me de cihekî bêlikirî girtiye.